GENERAL, NİKARÎ ROJNAMEVAN BİTİRSÎNÊ…

Bedirxan Epözdemir

Min ser nivîsê ji gelawêj bêpirs qerzkir.

Sedem ku gelek li xweşê min ço.

Bila min bibexşînin.

Bi rojane qîr, hawar û gale-gal general erd û ezman dihejîn ê.

Hêrs çoye hawara tirsê.

Kî hêrs dibî?

Tirsonek.

Kî ditirsê?

Niheq.

Ki niheqe?

Ewê ku bê perwa maf û azadîyan bin pêdike.

Rojnamevan gale-gal nake.

Bêqir û hawar e

Serbilind û kûbar e

Çinkî ji xwe bawer e.

Bêtirs û hêrs e

Bêtirs û hêrs e

Sedem ku ne niheqe

Bi rûmet û xwedan heqe.

Qenç ku li vê erda bej hêjmara wan hindik bî jî yên wek Ahmet Altan jî hene

Dê werin em bi kurdî guhbidine remza merxasîyê, rojnamewanê qedirbilind Ahmet Altan

Jİ SEROKÊ SERPERİŞTÎYA LEŞKERÎ RA*

<u>Ahmet Altan</u>

Werger ji Tirkî: Bedirxan Epözdemir

Hun vê şêwaza axaftina bigef, bêrêzî û bênezaket çawa di ecbînin û ev bêtirsîya we ji ku tê?

Haya we ji we heye hun çî dibêjin?

Hun divên kî bitirsînin?

Ji we weye ku emê bitirsin?
Baş guhbide min General, devberdin ji van gefên hovane,

Ji van eda û jestên bikîn û bihêrs,

Ev me natirsînin.

Hizirnekin, ku dema li vî welatî "dewleta kûr" tê gotin mabest kîye em nizanin, hizirnekin ku ji teqîna seyaran, ji kuştina kesên ku ji paşve têne lêdan agahdarîyên me tinenin.

Lê nexeme ji me ra,

Hun dikarin vî fêmbikin?

Gelo hun têdigehêjin ku hinêk meriv hene sedem ku welatê wan azad û bextîyar bî, ji tu tiştî narevin.

Hewilbidin ku hun têbigêhjin.

Devberdin ji van hewildanên bizdonek. Ev tiştén sikin.

Ev hemû terênakin ku em dev ji hewildanên rasteqîn berdin.
We doh hinek tiştan got.

We doh hinek tiştan got.

We kerem nişanda ku"her kes bila baldar bî û li cîyê rasteqîn bisekinê".

Hun dizanin "cîyê rasteqîn "li ku ye?
"Cîyê rasteqîn" li ku ye hun dizanin?
Cîyê ku meriv kar û pêwistîyên xwe bi dirûstî pêktinê, cîyê rasteqîn e.
Em li "Cîyê rasteqîn" disekinin.
Em pêwîstîyên karê xwe bi dirûstî tînine cîh û bi salane ku ew gelê bi derewan hatîye xapandin, agahdar dikin.
Hun li cîyê rasteqîn nasekinin.
Hun pêwîstîyên karê xwe bi cîh naynin.
Pêwîstîya karê we, parastina leşkerên xortin ku sipardarên we ne.
Li gel qeydên gav bi gav yên qamerayê we ji bo êrişa qereqolê tedbîrên ewlekarîyê negirt, we guh neda raporên îstixbaretê û dema pevçûn çêbû we qasî têrêbike hêzên arîkarîyê neşand, we wan zarokan terkê mirinê kir, ev cirmê we ye.
We erkên xwe nanî cîh.
Çima?
We çira wan zarokan ne parast?
Hun dizanin sedem vî, pêwîste ku hunê bêne darazandin?
Lê hun dizanin ku dadiger bangê we û dadigehê nake. Hun ji xwe bawerin, sedem ku meqamek tunu we darezînê.
Lê ev pêwîstîya darezandina we naguhirînê.
Lê bêguman saziyeke dest ji kar berdanê jî heye.
Texmin dikim, agahîya we ji vê sazîyê tuneye.
Sedem ku serokwezir, desthiletdar û parlemento ji we hisap napirsê, hun zêde wêrekin.
Lê, li vî welatî gel jî heye.
Gelêkê ku divê rastîyan bibihîzê.
Û dev ji pêsîra we bernade.
Em jî bernadin.
Bi rengeke tund û hêrs, li ber qameran û bi generalên xwe va, ew "mixtira" ku we da medyayê vê rastîyê nagûhirîn ê.
Hun ji me ra Bezele yé(Aktütün) şîrove bikin.
Ew zarok çira mirin?
Çima we pêşî li êrîşê negirt?
Tişteke dîn jî, me gotineke we femnekir.
"Li himberê êrîşên bi vî rengî bersiv û reaksîyona her ertêşek heye". Ev tê çî wateyî?
Yekemin êrîşek tune, em erîş nakin, rastîyan tînine holê.
Duwemîn, "her ertêş" li himberî van rexnan çawa reaksîyon nîşan dide?
Çawa reaksîyon nîşan didin hun nizanin.
Li welatên peşkewtî da li himberî karesatên wuha berpirsîyar di heman demîde ji karê xwe têne dûrxistin û têne darezandin.
Lê wusa xuyaye ku ewê di serê we da ev nîne.
Nexwe "reaksîyona ku leşker bide" çîye?
Ertêş, ji bo ku "dijmin" êriş tînê ser wan û divê wan ji holê rake têne perwerde kirin.

perwerde kirin.
Hun rastîyên ku em ratixine ber çevan wek"êrîş" dinirxînin, Me jî wek "dijmin" dibînin.
Eee, hunê çî bikin?
Hunê êrîşbikin, rojnameyê bombebikin, F-16 'an bişeynine ser me?
Hişê we li serê we ye, hun çî dibêjin?
Wê hunê berê ji êrîşê agahdarbin û zarokan neparêzin, lê ew rojnameyên ku vê rastîyê raxine ber çevan bi"reaksîyona ertêşê" bi tirsînin.
Li "cîyê rasteqîn" biseknin general.
Hedê xwe bizanin.
Li welatê me heftê milyon merivên bi dirafên ku ji dev xwe dibrin û ertêşa me li pîya dihêlin hene, hun me bi ertêşa me nikarin bi gefînin.
Ertêş, hacetêkê ku bi gefa hun bi karbînin û kêmasîyê xwe pê veşêrin nîne.
Haa, hun tişteke dîn jî dibêjin, "Ew kesên ku kirinên rêxistina terorê ya cudaxwaz wek serketî nîşan bidin, ji her dilopêk xwîna ku hatîye rijandin û wê bê rijandin wê berpirsîyar bin".
Binêrin hun vî rast dibêjin.
Lê kî "serketî nîşan dide"?
Ew rojnameyên ku dibejin pêşî li êrîşê nahate girtin, yan ev kesên ku bi zanetî peşî li êrîşê negirtin?
Hun vêga têgihîştin kî berpirsîyarê ji vê xwînê?
Hun bi berpirsîyarîyê dihisin?
Pêwîste hun bihisin.
Û dev ji gefan berdin, rastîyan şîrove bikin.
Gef û şêwaza we li me xweş nahat.
Rastîyan bêjin ji me ra.
Rastîyan.
Hinek wêrek bûn têrê dike.
Em bawerin dema wêrek bûna we jî weka hêrsa we mezin bî, hunê rastîyan ji me ra bêjin.

Em bendewarê wê rojê ne.

Taraf- 16.10.2008

epozdemir1@zonnet.nl